



Bernameya restoran û tiştên xwarinê

KURMANJI

Bernameya xwaringeh/restoran û tiştên xwarinê bernameyeka pîşeyî ye û bidestxistina dîplomeya pîşeyî armanca wê ye.

Bernameya xwaringeh û tiştên xwarinê ji te re yê ku hez dike di pratîkê de di karên girêdayî danê xwarinê yê nêzîkî mişterî û mêvanan li, bo nimûne, xwaringeh, nanpêjî yan dikanê bixebite.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendengeha bilind ya pîşeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwinî da xwendina xwe li xwendengeha bilind bidomîni.

SÊ PISPORIYÊN CUDA

Nanpêjî û şîrînîsazî

- Tu dê zanyariyan li ser kardestiya di warê nanpêjî û şîrînîsaziyê de werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, nanpêj yan şîrînîsaz kar bikî.

Tiştên teze, delîkates û xwaringihandin

- Tu dê zanyariyan li ser tiştên xwarinê, firotin, bijartina malzeme û madeyên xam, xwarinçêkirin, vexwarin, sifrehazirkirin û amadekarîkirin werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu, bo nimûne, karê firotinê li beşên tiştên teze û delîkatesê yê dikanê bikî.

Metbex û servîskirin

- Tu dê zanyariyan li ser xwarinçêkirinê li xwaringehê/restoranê, li ser servîskirinê û li ser karê baran werbigirî. Ev pisporî îmkane dide ku tu wek, bo nimûne, xwarinçêker, servîtrîs yan garson kar bikî.

Tiştên ku tu dê di vê bernameyê de fêr bibî

Tu dê zanyariyan li ser metodên kardestî yê kevin û nû, berhemsaziya tiştên xwarinê, xwarinçêkirin, servîskirin, danê xwarinê wek tevahiyek, firotin, xizmetkarî, paqijî, xwarinnasî, xwarinên taybetî û servîskirina alkolê werbigirî. Tu dê zanyariyan li ser plankirin, rêxistin, aborî û şîrketkariyê werbigirî. Tu dê şiyana xwe ya pêşwazîkirina mişteriyên û pêşkêşkirina xizmetê pêşde bibî.

Bona mirov xwe ji zîyanên karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernameyê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

Bernameya weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernameyên pîşeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernameyên pîşeyî de, tu dê zêdetir madeyên pîşeyî, yên ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî.

Zanîna paqijiyê, zanîna tiştên xwarinê û prosesa xwarinê, zanîna danên xwarinê û branşa xwarinê û xizmetkarî û pêşwazî madeyên taybetmend yên hevbeş yên vê bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Tu dê di vê bernameyê de li gel kesên din di pratîkê de xwe fêrî pîşeyê bikî. Tu dê xwe fêrî bikî ku tu hevkarîyê bikî û pêşwaziya mişterî û mêvanan bikî. Teorî û pratîk bi hevûdin re tên girê dan. Tu dê xwe fêrî bikî ku tu însiyatîvê bigirî, nerm, guhdar û behremend bî û bi serê xwe bixebitî. Tu dê karî plan bikî, bi cih bînî û kalîteya wî misoger bikî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawîya Bernameya xwaringeh û tiştên xwarinê de projeyeka lîseyê di warê pîşeyî yê ku te bijartiyê de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yên ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

Fêrbûna li cihê karî

Hin beşên xwendinê herî kêmtir 15 hefteyan li cihek yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yên ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

Şagirdîkirin

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêmtir nîva xwendina xwe li cihek yan çend cihên karî bikî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên bingehî yên xwendina bilind bi dest bixî. Hingî divê tu du kursên zêdetir yên zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê îngilîzî bixwînî. Hergav mafê te heye ku tu bijartina ferdî bi kar bînî û vê îmkanê li gel bernameyeka zêdekirî de jî bi kar bînî. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.